Omar Ahmed, B. (2020). Rêzbûna dîyarkerên piştî sereyî di girêya navî ya govera behdînî ya zimanê kurdî da. *Folklor û Ziman,* 1(2), 159-166.
**Wergirtin/Received:** 2020-08-06
**Qebûlkirin/accepted:** 2020-09-13
**ORCID:** 0000-0003-1661-427X

# RÊZBÛNA DÎYARKERÊN PIŞTÎ SEREYÎ DI GIRÊYA NAVÎ YA GOVERA BEHDÎNÎ YA ZIMANÊ KURDÎ DA

Bahiez Omar Ahmed*

**Kurte**

Dîyarkerên piştî sereyî di girêya navî ya govera Behdînî ya zimanê Kurdî da du cur in, morfîmên bend û morfîmên serbixwe. Me bi fer dît lêkolînekê li ser çawayîya pêkvehatin û rêzbûna evan dîyarkeran encam bidin. Lêkolîn li pey rêbaza wesfî şîtelkarî hatîye encamdan. Zêdebarî pêşekî û encaman, lêkolîn li ser du serbasan hatîye parvekirin: Di tewerê yekem da pêkvehatin û rêzbûna curên wekhev hatîye dîyarkirin û di tewerê duyem da pêkvehatin û rêzbûna curên cuda hatîye dîyarkirin. Li dawîyê jî encamên lêkolînê hatîne xweyakirin.



**Peyvên Sereke:** Dîyarker, girêya navî, morfîmên bend, morfîmên serbixwe, govera behdînî

## THE ORDER OF POSTADJUNCTS IN NOUN PHRASES IN BEHDINI KURDISH

**Abstract**

There are two kinds of postadjuncts (*determiners, modifiers, specifiers, attributives, etc)* in noun phrases in Behdini Kurdish: attached morphemes and separable morphemes. This study tries to investigate how postadjuncts are ordered when there are more than one postadjunct. The study was carried out in accordance with the descriptive analytical approach.

The study comprises two sections besides an introduction and conclusions. The first section deals with how similar postadjuncts accompany each other and are ordered, whereas the second section tackles how different postadjuncts accompany each other and are ordered. The research ends with some conclusions.

**Keywords:** Postadjuncts, noun phrases, Behdini Kurdish, attached morphemes, separable morphemes

* Prof. dr, Zaningeha Duhokê, Koleja Zimanan, Beşa Kurdî. Kurdistan/Îraq.
E-mail: bahiez.omar@uod.ac

**Pêşekî**

Di zimanê kurdî da, govera (local dialect) Behdînî, du curên dîyarkerên piştî sereyî (head)[1] di girêya (phrase) navî da hene (Maruf Fattah, 1997, r. 202-205) morfîmên bend û morfîmên serbixwe (Ali Al Khuli, 1982, r. 174). Hindek zêdebûna morfîmên bend jibo sereyî bi "ronanî naweweyî frêzî nawî" navdikin û zêdebûna morfîmên serbixwe bo sereyî bi "ronanî dereweyî frêzî nawî" (Wilya Mihemed, 2000, r. 36-40, 55-65). Bi boçûna me eve hemû dîyarker in, çinku yan sereyî ji layekî ve didine dîyarkirin yan layenekê sereyî didine dîyarkirin.

Dîyarkerên piştî sereyî ewên morfîmên bend di evê goverê da tenê **nîşane** (marker) ne û yekser bi sereyî ve dimînin çinku morfîmên bend in, lê ewên morfîmên serbixwe dibin çar cur: Hevalnav (adjective), cihnav (pronoun), girê[2] û hevok (clause) û her dem pêdivê ye di navbera evan û sereyî da nîşaneka rewşa xwedantîyê (genitive case) (ê, a, ên)[3] hebe, tenê eger dîyarkerê piştî sereyî ew **nasnav** be yê ji **navê pîşeyî** peydabûyî; eve dê bê nîşana rewşa xwedantîyê bikeve piştî sereyî, da ku ji navê pîşeyî bihê cudakirin.

**1. 1. Navûnîşanê lêkolînê:** Ev lêkolîne bi navê "Rêzbûna Dîyarkerên Piştî Sereyî di Girêya Navî ya Govera Behdînî ya Zimanê Kurdî da" ye[4].



**1. 2. Giringîya lêkolînê**: Giringîya lêkolînê di hindê da ye, da bizanîn demê pirtir ji dîyarkerekî li piştî sereyî di girêya navî da hat; dê ew dîyarker çawa rêz bibin, çi ew dîyarker heman cur bin yan curên cuda.

**1. 3. Kerestê lêkolînê:** Kerestê lêkolînê ji govera behdînî hatîye wergirtin ku biwarê cografî yê evê lêkolînê ye.

**1. 4. Rêbaza lêkolînê:** Lêkolîn li pey rêbaza wesfî şîtelkarî (descriptive analytical) (Zekeriya,1983, r. 146) hatîye encamdan.

**1. 5. Pirsîyarên lêkolînê:** Di evê lêkolînê da me divê bersiva evan pirsîyaran bizanin:

**a.** Erê dîyarkerên heman cur bi têgihên (concept) cuda, pêkve dihên û çawa rêz dibin?

1 Bo têgehê "sere"yî binêre: (Omer Ehmed, 2008, r. 89).

2 Ji bilî girêya karî, em hemû girêyên dî bi girêyên navî didanîn; çinku bi boçûna me sere tê da **nav** e. Bo curên navan binêre: (Omer Ehmed, 2005, r. 4- 5).

3 Bo evan nîşanan binêre: (Omer Ehmed, 2015, r. 141).

4 Di evê lêkolînê da me tenê govera Bahdînî wergirtîye, çinku divê bi lêkolîn bihê selmandin ku di hemû dayalêkta serî ya zimanê kurdî da ev babete wekhev e.

**b.** Erê dîyarkerên curên ewan cuda, çawa rêz dibin û kîjan li berî kîjanê dihê di evê goverê da?

**1. 6. Pişkên lêkolînê:** Ev lêkolîne ji bilî pêşekî û encaman (conclusions), du teweran bi xwe ve digire. Di tewerê yekem da, dê pêkvehatin û rêzbûna curên wekhev yên dîyarkeran bihên dîyarkirin. Di tewerê duyem jî da, dê pêkvehatin û rêzbûna curên cuda bihên xuyakirin.

**2. Pêkvehatin û rêzbûna curên wekhev yên dîyarkeran**

**2. 1. Pêkvehatin û rêzbûna nîşanan:**Di evê goverê da gelek curên nîşanan dibin dîyarkerên piştî sereyî di girêya navî da ku eve ne: Nîşana nenasyarîyê "**ek**", nîşana cextkirinê (emphasis) "**jî**"[5], nîşana pila berawirdî (comparative) "**tir**"[6], nîşana pila bala (superlative) "**tirîn**"[7], nîşana zayendî (gender) "**î**, **ê**"[8], "**o**, **ê**"[9], nîşana pirhejmarîyê "**a**(**n**)"[10], "**îno**"[11], wekî:

mirov- **ek**

xelk- **jî**

baş- **tir**

ciwan- **tirîn**

Azad- **î**

Nesrîn- **ê**

kur- **o**

kiç- **ê**

mirov **a**(**n**)[12]

xelk- **îno**



---

5 Ev nîşane li devera Akrê dibe "îş". Her weha ji ber ku eve morfîma bende di zimanê Kurdî da û li gel **nav** û **kar**an jî dihê, wekî "di mal **jî** da", "dihat **jî**", dibe nîşane û nabe hevalkar. Ji bo pirtir zanyarîyan binêre: Finch, G.(2000): 84- 85].

6 Ev nîşane tenê li gel navê hevalnavî dihên. Jibo evî curê navî binêre: (Omer Ehmed, 2005, r. 5).

7 Ev nîşane tenê li gel navê hevalnavî dihên. Jibo evî curê navî binêre: (Omer Ehmed, 2005, r. 5).

8 Ev nîşane yên doxê «min» binêre: (Baîz Omer Ahmed, 3: 140- 141).

9 Ev nîşane yên doxê gazîkirinê ne binêre: (Baîz Omer Ahmed, 3: 141).

10 Ev nîşane yên rewşa tewangê ne, binêre: (Omer Ehmed, 2015, r. 140- 141).

11 Ev nîşane yên rewşa gazîkirinê ne, binêre: (Omer Ehmed, 2015, r. 141).

12 Bo zanîn "n"ya nîşana pirhejmarîyê (an) di evê goverê da nahê gotin, lê ji ber baştir rûnkirinê me li evê derê dana.

Di evê goverê da ev nîşane pêkve dihên û bi evî rengî rêz dibin:

**2. 1. 1.** Nîşana nenasyarîyê û nîşana cextkirinê, wekî:

mal- **ek- jî**

**2. 1. 2.** Nîşana nenasyarîyê û nîşanên rewşa min (tewangê), wekî:

kur- **ek- î**

kiç- **ek- ê**

çend gundî- **ek- a**

**2. 1. 3.** Nîşanên rewşa tewangê û nîşana cextkirinê, wekî:

kur- **î- jî**

kiç- **ê- jî**

çend gundî- **a- jî**

**2. 1. 4.** Nîşana nenasyarîyê û nîşanên rewşa tewangê û nîşana cextkirinê, wekî:

zelam- **ek- î- jî**,



jinik- **ek- ê- jî**

çend xal- **ek- a- jî**

**2. 2. Pêkvehatin û rêzbûna hevalnavan:**

Hemû navên hevalnavan dişên bibin dîyarkerên piştî sereyî û rolê hevalnavî bibînin, wekî: “ciwan, law, kirêt, baş, xirab, xweş, nexweş, pîr, xurt, cihêl, kevin, nuî, bihêz, bêhêz, dirêj, kurt, teng, fireh, qelew, lawaz, ze`îf, zirav, stuîr, tirş, şirîn, tehl, suîr, sor, zer, kesk, reş, spî, tarî, ron, . . . ”, wekî:

hevalê **baş**

mirovê **xirab**

darê **stuîr**

mala **mezin**

Hêjayî gotinê ye ku hevalnavên dîyarkerên piştî sereyî pêkve nahên.

**2. 3. Pêkvehatin û rêzbûna cihnavan:**

Em li evê derê fer e bibêjin ku di evê goverê da tenê du cihnav dibin dîyarkerên piştî sereyî ew jî cihnavê xweyî (reflexive) (**xwe**) ye û cihnavê hevbeş (reciprocal) (**êkudu**), wekî:

hevalê **xwe**

mala **êkudu**

Pêdivê ye bibêjîn ku ev cihnave jî pêkve nahên.

**2. 4. Pêkvehatin û rêzbûna girêyan:**

Ew girêyên navî yên dibin dîyarkerên piştî sereyî ji layê pêkhatinê ve dibin du cur: Girêyên navî yên sade (simple) û girêyên navî yên lêkdayî (compound). girêyên navî yên sade jî dibine girêyên navî yên sade yên nawik (minimal) û girêyên navî yên sade yên mezinkirî (expanded)[13], wekî:

hevalê **min**

babê **hevala min**

mala **mezintir**

dara **li hindav banî**

navê **min û birayê te**

Li evê derê fer e bibêjîn ku tenê girêyên navî yên mezinkirî kêm caran wekî dîyarkerên piştî sereyî, pêkve dihên, wekî:

xanîyê **hevalê wî Ferhadî**,

**2. 5. Pêkvehatin û rêzbûna hevokan:**

Ew hevokên ku dibine dîyarkerên piştî sereyî di şîyan da ye hevokên sade bin (nawik yan mezinkirî) yan jî hevokên lêkdayî, wekî:

ew jinika (ku) **hatî**

ew tirimbêla (ku) **em hero li ser rêya gundî dibînîn**

ew mirovê **hatî û çûyî**

Hêjayî gotinê ye ku hevok jî pêkve nahên.

13 Ji bo evan curên girêyan binêre: (Omer Ehmed, 2008, r. 78- 84).

**3. Pêkvehatin û rêzbûna curên cuda yên dîyarkeran**

**3. 1. Pêkvehatina nîşanê û hevalnavî:**

Li evê dirê tenê nîşana nenasyarîyê (ek) û hevalnavek pêkve dibin dîyarkerên piştî sereyî, ew jî li pêşîyê nîşana nenasyarîyê bi sereyî ve dimîne û paşî nîşaneka rewşa xwedantîyê dihê û paşî hevalnavek, wekî:

kevir- **ek-**ê **mezin**

dar- **ek-**a **dî**

**3. 2. Pêkvehatina nîşanê û cihnavî:**

Dîsa tenê nîşana nenasyarîyê û cihnavek dibin dîyarkerên piştî sereyî, wekî:

mirov**- ek-**ê **xwe**

zevî**- ek-**a **êkudu**

**3. 3. Pêkvehatina nîşanê û girêyê:**

Nîşana nenasyarîyê û girêyek jî dişên bibine dîyarkerên piştî sereyî, wekî:

heval**- ek-**ê **me**



pismam**- ek-**ê **Azadê hevalê we**

pez- **ek-**a **xalê te Osmanî**

dikan**- ek-**a **mamê min û xalê te**

**3-4. Pêkvehatina nîşanê û hevokê:**

Nîşana nenasyarîyê û hevokek bi evî awayî dibin dîyarkerên piştî sereyî, wekî:

zelam**- ek-**ê **nivistî**

pale ek-ê **evro li ser xanîyê me kar dikir**

leşker- ek-ê (ku)[14] **girtî û berdayî**

14 Amrazê gihandinê "ku" kerestekê ne bixurtî ye, di şîyan da ye hebe yan nebe.

**Encam**

Di evê lêkolînê da em gehiştîne evan encaman:

**1.** Ji curên wekhev yên dîyarkerên piştî sereyî, tenê ev dîyarkere pêkve dihên û bi evî awayî rêz dibin:

- Nîşana nenasyarîyê û nîşana cextkirinê, wekî:

dikan **ek- jî**

- Nîşana nenasyarîyê û nîşanên rewşa tewangê, wekî:

jinik **ek- ê**

- Nîşanên rewşa tewangê û nîşana cextkirinê, wekî:

Mamosta- y[15]**-a- jî**

- Nîşana nenasyarîyê û nîşanên rewşa tewangê û nîşana cextkirinê, wekî:

nan-**ek-ê-jî**

- Tenê girêyên navî yên mezinkirî hindek caran pêkve dihên, wekî:

hevalê **birayê min Azadî**



**2.** Ji curên cuda yên dîyarkerên piştî sereyî jî tenê morfîmên bend û serbixwe pêkve dihên û li pey evê yasayê rêz dibin:

**sere** + **dîyarker** (morfîma bend) + nîşaneka rewşa xwedantîyê + **dîyarker** (morfîma serbixwe)

Pêkvehatina evan dîyarkerên piştî sereyî jî bi evî rengî ye:

- Pêkvehatina nîşana nenasyarîyê û hevalnavî, wekî:

mirov- **ek-**ê **jêhatî**

- Pêkvehatina nîşana nenasyarîyê û cihnavî, wekî:

Mamosta-y-**ek-**a **xwe**

-Pêkvehatina nîşana nenasyarîyê û girêyê, wekî:

kur- **ek-**ê **birayê wî**

-Pêkvehatina nîşana nenasyarîyê û hevokê, wekî:

dizîker-**ek-**ê **(**ku) **duhî revî**

15 Ev (y)ye semîvawil e. Wekî dîyardeyeka dengsazî hatîye.

**Çavkanî**

Ali Al Khuli, M. (1982). *A dictionary of theoretical linguistics,* (first edition), Lebanon: Mektebet Libnen.

Finch, G. (2000). *Linguistic terms and concepts,* Ebbw Vale, Great Britain: Palgrave, Creative Print & Design (Wales).

Maruf Fattah, M. (1997). *A Generative Grammar of Kurdish,* (doctoral dissertation), University of Amsterdam.

Omer Ehmed, B. (2005). Curekanî naw le şêweyî juruwî zimanî kurdî da "goverî badînî". *Guvara Zankoya Dihok,* 8(2), 1-8.

Omer Ehmed, B. (2008). Girê di dayalêkta serî ya zimanê kurdî da "govera dadînî". *Guvara Zankoya Dihok,* 11(1), 77-92.

Omer Ehmed, B. (2015). Nîşanên nifşî û komkirinê di govera behdînî ya kurdîya serî da. *Guvara Zankoya Dihok,* 18(2), 138-145.

Wilya Mihemed, H. (2000). *Frêzî nawî û frêzî karî le kirmancîyî jûrû da*, (nameyî master). Zankoyî Silêmanî.



Zekeriya, M. (1983). *El elsiniye (`ilm el luxe el hedîs) el mebadî wel e`lam,* (ç. 2.), Beyrût:Al Muwesese l Camî`îye lîl Dîrasat wel Neşir wel Tewzî`